
*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (252) 20-04-2015 Buha (150) Tûmen*



**Birêz Hesen Şerefî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ:**

**"Hindî ku rejîma Îranê di hemberî cîhana derve û welatan de paşekêşê bike, zext û givaşa li ser xelkê navxwe û azadîxwazan jî zêdetir dike".**

R: 4

## Îran gefa herî mezin e li ser aştiya cîhanî



**Sinatorê Komarîxwaz ê Amerîkayê bi navê , di rapora belavoka "Hîl" a ser bi kongireya wî welatî de ragehand ku, bidestxistina çeka Etomî ji aliyê Komara Îslamî ya Îranê ve, pirsgirêka herî sereke ye li ser rêya aştiya cîhanî, û hewce ye ku em rê ji terorîstan bigirin da ku nekarin xisaran bigehînin Amerîka û hevpeymanên wê.**

Kirêk herweha di doma gotinên xwe de radigehîne ku, rejîma Îranê ji sozên ku daye dewleta Obama, paşve dikêşe û daxwaza rakirina bilez a dorpêçan dike û eva jî bi wateya piştevanîkirina bi milyardan Dolarî ji torên terorîstî ên Îranê tê, û Komara Îslamî jî weke piştevanê herî mezin ê terorîstan li cîhanê da nasîn.

Eva di demekê de ye ku her du sinatorên Komarîxwaz Mark Kirêk û Rabêrt Minindêz bi hev re gelaleyek pêşkêşî Sinaya Amerîkayê kirine û têde daxwazê dikin ku hekî keysa etomî heya dawiya heyva Hezîranê negîje rêkevtina dawiyê, dorpêçên nû li ser Îranê her bimînin.

## Sûriye dixwaze ku mijara xweseriyê gotûbêj bike

**Wezîrê Lihevhatina Niştimanî yê Sûriyê Elî Heyder ragihand Hikûmeta Sûriyê amade ye ku mijara "xweseriyê" gotûbêj bike.**

Elî Heyder diyar kir, li Rojavaya Kurdistanê xweserî ramanek e û Hikûmeta Sûriyê dikara li ser wê mijare danûstandine bike. Heyder anî ziman, ew partiyên kurdî yên li Rojavaya Kurdistanê normal dibînin û wiha got: "Li Sûriyê daliqandina alên kurdî ji bo me ne pirsgirêk e."

Herwiha Heyder eşkere kir ku meha borî li Amûdê ligel berpirsên Kantona Cezîre re civîya ye û wiha domand:

"Hikûmeta Sûriyê amadeye mijara "xweseriyê" gotûbêj bike, ji ber ku ev proje hêj di ramanan de ye û ne biryarekê tekez e. manca me, ew bû ku



em navbera Hikûmeta Sûriyê û xelkê herêmê xweş bikin."


**"Axivtinên Kalkan xizmetê bi yekparçeyiya Kurdistanê nakin".**



Birêz Mihemednezîf Qadirî


2

**Vegeriyan bo xala sifrê**




3

**Herifandina kesayetî û şunasa neteweyî bi pêkenokan**




6

**Mohreyên bîhanî di şerê Îslamîstan de**



7

**"Du birayên min di nav refên PDKÎ de şehîd bûn".**



Fatime Mihemedpena

8

**Xelatgirê Nobelê, "Guenter Grass" koça dawiyê kir**



10


www.arsivakurd.org

## Sergotar

# Xamineyî û Lozan

**Şehab Xalidî**

Bêguman her demekê ku Komara Îslamiya Îranê dikeve nav kirîzeke kûr de, axivtina dawiyê Xamineyî bi xwe dike, lê carina berevajî xwe dide aliyekî, û hewl dide xwe bêalî nîşan bide, û guneha paşekêşekirina ji helwestên xwe yên pêşîn bixe stûyê dewletê.

Belê herwekî em dizanin Ehmedînijad ku bi siyasetên xwe yên çewt ragehand ku biryarnameyên Konseya Ewlekariyê kaxezên diriyayî ne, û Xamineyî jî spasiya xelkê dikir ku di hemberî şeytanên mezin wate Amerîkayê de xweragir in, û teslîmî tehrîmên wan nabin, û xelkê hejar xistin nav rewşeke dijwar de, û îro rojê neçar in paşekêşeyê bikin, em dibînin ji aliyekî ve, nevêrin bi yekcarî bêjin ku em encama rûniştina Lozanê ret dikin, û ji aliyekî din ve jî dixwazin vê paşekêşeya xwe bipeçêvin, û hêcetan jê re bînin.

Lê herçend ku ew paşekêşeya wan jî di dirêjheyam de zehmet e ku bi qazancê xelkê hejar ê welatê me bi dawî bê, lê em dibînin ku vê paşekêşeya rejîmê di hemberî Amerîka û Rojavayiyan de, şer û kêşeyên navxweyî yê di navbera baskên cur bi cur ên rejîmê de pirreng kiriye.

Belê îro rojê em dibînin ku ew xetên sor –rûniştina di gel şeytanê mezin, û teslîmnebûna di hemberî tehrîman de- hatin bezandin, û Xamineyî jî giraniya xwe di nav alîgirên xwe de ji dest dide, lewra baskê wî, wî cardin tûj dike, ku helwestên tundûtûj di hemberî baskên dijber de bigre. Herçend ku heyeta gotûbêjkar li gora pêşniyarên wî û bi dilê wî jî gotûbêj bi welatên Rojavayî re kiribin jî, lê dîsan encama gotûbêjan wisa nîşan dide, ku Xamineyî bi sedema gefxwarinên xwe yên pêşîn, û niha jî berevajî bi paşekêşekirinê -nermiya qehremanane (nermişê qehremanane)- giraniya xwe ji dest bide, lewra ew hewl dide ku xwe vê care bêalî nîşan bide, û dibêje ku ez ne dijî encam rûniştina Lozanê me, û ne jî razî bi encama wê rûniştinê me.

## Birêz Mihemednezîf Qadirî: Axivtinên Kalkan xizmetê bi yekparçeyiya Kurdistanê nakin



**Kurdistanmedia: Mihemednezîf Qadirî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ di gotûbêjekê de, tevî pêdagirîkirina li ser vê ku ezmûna Başûra Kurdistanê bi hêsanî bi dest nehatiye, ragehandiye ku axivtinên Kalkan xizmetê bi yekparçeyiya Kurdistanê nakin.**

Çend rojan berî niha Kalkan endamê avaker, û konseya birêvebiriya KCK'ê li ser Başûra Kurdistanê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê axivîbû.

Ew axivtina Kalkan digel dijkiryara Partiya Demokrat ya Kurdistanê berbirû bibû. Her di vê derheqê de malpera fermî ya PDK'ê jî bi rêzdar Mihemednezîf Qadirî re hevpeyvînek pêk anîbû.

Li gora gotina rêzdar Mihemednezîf Qadirî axivtinên Kalkan xizmeta yekparçeyiya Kurdistanê nakin, û serkevtin di vê yekê de ye, ku hêz û aliyên Kurdistanî yekdeng û yekhelwest bin, û birêvebiriyeke hevpar hebin.

## Şandeke PDKÎ di taziya du kesayetiyên welatparêz de beşdarî kir

**Kurdistanmedia: Şandeke PDKÎ di taziya du kesayetiyên welatparêz bi navên Hacî Mehmûd Axa û Husên Îbrahîm debeşdarî kir.**

Ew şanda PDKÎ bi serperestiya birêz Çeko Rehîmî endamê Komîteya Nawendî ya PDKÎ di wan du taziyan de beşdarî kir.

Hacî Mehmûd Axa ku serokê êla Mîravdelî bû, yek ji dostên emegdar ên PDKÎ, û tevgera rizgarîxwaziya Rojhilata kurdistanê bû. Navbirî di salên 1967-1968'an de piştgiriya PDKÎ kiribû.

Herwisa rehmetî Husên Îbrahîm jî, yek ji dostên emegdar ên PDKÎ bû. Şanda PDKÎ peyama hevxemiya PDKÎ gehande malbatên herdu dostên xwe yên koçkirî.



www.arsivakurd.org

## Endameke PDKÎ koça dawiyê kir

**Kurdistanmedia: Xatûna Mencûlî Keleşî Endama PDKÎ bi sedema nexweşiyê, mixabin koça dawiyê kir, û di goristana şehîdên PDKÎ de hate veşartin.**

Menculî Keleşî temen 41 salî, keça Mehmûd bû ku di nav malbateke welatparêz, di gundê Kûra jorîn ya navçeya Enzelê ya ser bi Urmiyê hatibû dinê. Navbirî keçmama şehîd Kerem Keleşî bû, ku di nav refa PDKÎ de şehîd bibû.

Herwisa birayekî Mencûliyê di nav refa PDKÎ de kêmendam bûye, û niha li derveyî welat dijî.

Xatûna Mencûlî Keleşî di sala 1993 (1372)'an de, di gel birêz Qasim Keleşî pêşmergê PDKÎ jiyana hevpar pêk anî, û her ji wê demê ve heta dawiya jiyana xwe, endama Rêxistina Aşkere ya PDKÎ, û endama Yekîtiya Jinan jî bû.

Ew endama PDKÎ heta dawiya jiyana xwe bi rêbaza PDKÎ emegdar ma. PDKÎ sersaxî li malbata wê dike, û xwe li xem û kovana wan de beşdar dizane.



## Çend endamên PDKÎ di bûyera hatûçûnê de canê xwe ji dest dan




**Kurdistanmedia: Bûyera hatûçûnê li ser riya Mesîf -Hewlêrê, bû sedema vê ku sê kes ji endamên du malbatên PDKÎ canê xwe ji dest bidin.**

Di vê bûyera nexweş de Soheyla Şerîfzade endama PDKÎ û keça Îsma'îl Şerîfzade naskirî bi "Qale sûr" pêşmergê PDKÎ di gel kurê xwe yê du salî canê xwe ji dest dan. Herwisa jinek bi navê Mêhrî Îzedînî hevjîna kak Peyman Dafi'î endamê PDKÎ û pêşmergê pêşîn yê PDKÎ jî canê xwe ji dest dan.

Termê Soheyla Şerîfzade û kurê wê yê du salî bi beşdariya endamên rêber, kadr û pêşmerge û malbatên wan di cimata şehîdên PDKÎ de bi axê hate spartin.

Mixabin di bûyereke din ya hatûçûnê de jî, Cewad kurê birêz Axacan pêşmergê pêşîn yê PDKÎ û endamê emegdar yê PDKÎ canê xwe ji dest da. Em sersaxiyê dibêjne malbatên wan ezîzan, û xwe hevbeşê xem û kovanên wan dizanin.

# Vegeriyan bo xala sifrê



Mistefa Hicrî




www.arsivakurd.org

Di encamê de roja Pêncşemî 02.04.2015 (13.01.1393)'an û piştî nêzîk bi 18 mehan gotûbêjên di navbera Komara Îslamiya Îranê û şeş mezinhêzên cîhanî de, derheq mehandina oranyomê ji aliyê Îranê ve, daxuyaniyeke kurt ku herdu alî li ser beşek ji çarçoveya giştî ya wê sax bibûn, ji aliyê Mihemed Cewad Zerîf Wezîrê Karê Derve yê Îranê, û Fidrîka Mogrînî berpirsyara Siyaseta Derve ya YE'ê di Lozana Swîsê de hate xwendin, ku biryar e piştî domandina gotûbêjan, heya meha Pûşperê bigihîjin lihevkirina dawiyê.

Di meha Rezbera sala 1392 (2013)'an de, û berî destpêkirina gotûbêjan di Jinêva Swîsê de, derheq pirsa mehandina Oranyomê ji aliyê Îranê ve, bi armanca destpêregihîştina bi çeka navikî, di gotarekê de di bin serxetê "gelo rejîma Îranê ber bi guhertinê ve pêngavan hildigre?", Min bi şirovekirina rewşa aloz ya Îranê, û hest bi metirsîkirina deshilatdarên wî welatî, û li ser veyî hemiyan Elî Xamineyî rêberê rejîma Îranê, derheq herifîna aboriya welat – ku sedema beşek ji wan sepandina wan dorpêçan bû ku ji aliyê NY, û welatên rojavayî ve bi ser Îranê de hatin sepandin- nivîsand ku ji bo rizgarkirina Îranê ji destê wan dorpêçan, rejîm di encamê de wê serî di hemberî şert û mercên Rojava de bitewîne, heya derfetek ku jê re tê pêş, wê dest ji wan bernameyên xwe yên bilindfirane hilgire. Daxuyaniya 2'ê Nîsanê, ya Lozanê rastbûna vê pêşbîniyê selimand.

Serbarê vê ku ew daxuyaniya fermî gellek kurt bû, û li gora gotina aliyên gotûbêjkar, hemû ew xal nexistin rû ku di vê çarçoveyê de lihevkirin li ser çê bûye, û beşek jî ji xelkê veşartî ye, lê ya ku di vê daxuyaniyê de xistine berbas, û bi taybetî axivtinên aliyan bo ragehandinan, piştî xwendina daxuyaniyê me digehîne vê encamê ku:
1-Îran razî bûye bi vê ku di nav nawendên mehandina Oranyomê de, nawenda bajarê Netenzê tenê nawendek be ku mehandina oranyomê encam dide, û radeya mehandina vê oranyomê nabe zêdetir ji %3.67 be, niha ku 10 hezar kîlo oranyoma mehandî heye, dibe vê oranyomê ji 300 kîloyî, kêmtir bike, û heya 15 salan di nawenda Ferdo mehandina oranyomê nehê kirin, heya 15 salan tu binkeyeke mehandinê ya nû ava neke, û 2 ji 3 ya santrîfiyojên xwe kêm bike.

2-Îran razî bûye bi vê ku di bin çavdêriya hertimî ya Ajansa Navneteweyî ya Têhna Navikî de be, û her demekê ku ew bixwazin azad bin serdana her cihekî bikin ku şik û guman li ser hebin, xeynî vê ku bi dezgehên gellek pêşkevtî wê di bin çavdêriyê de bin, bi vî awayî hemû riyên mehandina oranyomê bi armanca çêkirina çekên navikî ji Îranê tê gitin.
3- Di hemberî vê serîtewandina Îranê ji bo şert û mercên Rojava de, pêngav bi pêngav dorpêçên aborî li ser Îranê wê bêne rakirin, bi mercekê ku ÎAEA biselimîne ku Îranê ew xalên ku qewla cîbicîkirina wan daye cî bi cî kiribe. Bi vî rengî Komara Îslamiya Îranê piştî nêzîk bi 12 salan serhişkî, û pêdegiriya li ser daxwaziyên rojava derheq mehandinma oranyomê bi armanca çêkirina çeka etomî, bi tabkirina sedan milyard dolarî zirar, û veqetiyana ji civaka navneteweyî, û bi nirxa birçîtî û bêkariya xelkê Îranê û ....hwd, derfeta vê bilindfiriyê jê re namîne, û vedigere ser xala sifrê.

**Deskevta xelkê Îranê ji vê sazanê çi ye**

Bêguman hekî aliyê gotûbêjkar heya dema diyarîkirî (Meha Hezîranê) li hev bikin, piştî rakirina (yan helavîstîhêlana) dorpêçan, wê aboriya nexweş ya xelkê bêhneke rehet vede, û kar û kesabeta xelkê welat wê vegeşe, ku armanca xelkê jî her ew e. Xweşî û şahiya xelkê Îranê piştî ragehandina daxuyaniyê jî, nîşaneya hêvîdarbûna wan bi vê guhertina erênî ye li ser jiyana wan. Eşkerekirina vê dilxweşiyê ji aliyê xelkê ve, hilgirê peyameke dina ya girîng a siyasî ye jî, ku ew jî eva ye ku hekî rejîmê carina rêpêvîn bi alîgirên xwe didane dikirin jî, û diruşma "Têhna (enirjî, wize) navikî mafê bêgotin yê me ye" digotin, ew tenê diruşmên teblîxatî bûn, hekî ne eva nine ku em dibînin ku li gora daxuyaniyê, şiyana çêkirina çeka navikî ji rejîmê tê standin, lê xelk dilxweş in û dadikevin kolanan, û dilxweşiya xwe eşkere dikin?
Lê li gora ezmûnekê ku me ji vê rejîmê heye, aliyê kêm di demek kurt de rewşa ewlehiyê wê wekî xwe tundûtîj bimîne, hekî xiraptir jî nebe. Tê çaverêkirin jî ku hekî aboriya xelkê baştir be, xelk bi awayekî micidtir û berfirehtir daxwaziyên xwe ên din ku azadî û nemana vê rewşa emniytî ya tundûtîj e, û bi ser wan de zal e, bînin gorê. Daxwaziyek ku daxwaza piraniya xelkê Îranê ye, lê hejarî û hewildana ji bo peydakirina nan, ew daxwaziya wan kiriye daxwaziyeke pile du.


**Deskevta rejîmê ji vê sazanê**

Hekî lihevkirina dawiyê pêk bê, hêdî hêdî rejîm dorpêçên aborî li ser wê têne rakirin, aboriya wê ber bi baştirbûnê ve diçe, û destên wê vekirîtir dibin ji bo domandina siyaseta "şandina derve ya şoreşê", wate her eva ku heya niha kiriye û dike jî, der

Dom R:5



**Rêzdar Hesen Şerefî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ: “Hindî ku rejîma Îslamî ya Îranê di hemberî cîhana derve û welatan de paşekêşê bike, zext û givaşa li ser xelkê navxwe û azadîxwazan jî zêdetir dike”.**



**Malpera Kurdistanmedia digel birêz Hesen Şerefî cihgirê sekreterê giştî û berdevkê PDKÎ derheq lihevkirina welatên 5+1 û Komara Îslamiya Îranê gotûbêjek pêk aniye, ku eva jêr deqa wê gotûbêjê ye:**

**Pirs: Kak Hesen herwekî ku hûn agehdar in, roja pêncşemiyê, 13’ê Xakelêwe (2’ê Nîsana 2015)’an piştî gotûbêjeke dirêjheyam jihevtêgihîştinek (tefahomnameyek) di navbera welatên 5+1 û rejîma Îranê derheq pirsa navikî hate ragehandin. Bi baweriya we ya ku hate ragehandin tewahiya wan mijaran e ku li ser wan li hev kirine?**

**Bersiv:** Ya ku wekî jihevtêgihîştin (tefahomname) hate ragehandin, zehmet e ku tewahiya wan mijaran bi xwe ve girtibe ku bas li ser hatibe kirin, û li ser wan basan li hev kiribin, ji ber ku berî ragehandina jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) bas ji vê kirin ku ew bi hev re sax bûne ku çi beşek ji wê jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) ragehînin, û çi beşekê jî ranegehînin.

**Pirs: Bas û axivtinên berpirsyarên Amerîkayî û Îranî, li ser vê beşê ji jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) jî ku ragehandin cudahî pê ve dixuya, çawa ye ku her yek ji wan bi awayekî xalên jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) bas dike?**

**Bersiv:** Ya ku di destpêkê de ji aliyê nûnerê YE, û Wezîrê Karê Derve yê Rejîma Îranê ve hate ragehandin, cudahiyeke berçav pê ve xuya nedikir, lê piştre ku her yek ji wezîrên derve yên Amerîka û Îranê bi cuda bas li ser kirin, cudahiyek pê ve dixuya, ku ew yek jî vedigere ser vê ku her yek ji wan zêdetir bo berdengên xwe axivtin kirine, em dizanin ku hem li Amerîka û hem jî li Îranê, hinek alî û çend organên bi bandor ji encama wan gotûbêjan nerazî ne, û di rastî de her yek ji wan aliyan di axivtinên xwe de, bi awayekî li ser xalên jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) qise dikin, ku hekî nekarin berdengên xwe razî jî bikin, aliyê kêm wan bêdeng bikin.

**Pirs: Derheq ya ku wekî jihevtêgihîştin (tefahomname) hate ragehandin, cuda ji vê ku her yek ji wan çawa bas dikin, PDKÎ çawa vê yekê şirove dike?**

**Bersiv:** Naveroka wê jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) ku hate ragehandin eşkere dike, ku dorandiyê sereke rejîma Îranê ye, herçend ku vê rejîmê bi dirêjahiya temenê xwe her dorandinek jî wekî serkevtin çav lê kiriye, lê em dizanin ku rejîma Îranê demek dirêj e ku bas ji çalakiyên xwe yên navikî dike, û zêdetir ji 12 sal e ku bi sedan milyard dolarî ji samana xelkê Îranê di vê riyê de xerc kiriye, her di vê derheqê de jî, gellek astengî jî ji xwe û xelkê Îranê re pêk anîne, û bi sedema dorpêçên aborî jî bi milyardan dolarî zirar gihandiye xelkê Îranê û jiyana xelkê bi astengiyan re berbirû kiriye, bêkarî zêde bû, û gellek piroje sekinîn, niha li gora vê jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) ew hatiye ser xala sifrê, yanî hekî rejîma Îranê di salên borî de, berî ku vê hemû zirarê bigehîne xelkê Îranê, û serê xwe ji bo naveroka jihevtêgihîştineke (tefahomnameyeke) bi vî rengî bitewîne, ne ew hemû zirar digihîştin xelk û samana wan, û ne jî ew hemû arîşe û kêşe di gel cîhana derve de, wê jê re pêk hatiban.

**Pirs: Rast e ku rejîma Îranê bi serîtewandina xwe, û girîngî nedan bi daxwaziyên cîhana derve, û henekê xwe kirin bi biryarên NY, û wekî kaxezên diriyayî binavkirina biryarnameyên dorpêçên aborî, û heya eva ku gemaro wekî vegeşîn û xwebijîviyê bi nav dikirin, û di encam de ew hemû zirar gehandin xelkê Îranê, lê naveroka jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) çawa ye, û çawa hatiye darêtin?**

**Bersiv:** Naveroka jihevtêgihîştinê (tefahomnamê) bi awayekî hatiye amadekirin ku eva rejîma Îranê qebûl kiriye, hemû qewldan (te’ehod) e, lê welatên 5+1, eva ku qebûl kirine, yan berteng (sînordar) e, yan mercdar e, yan helavîstin e, û yan jî hemû girêdayî ne bi wan mercên ku jê re danîne, çi di asta santrîfiyojan de, yan derheq mehandina Oranyomê, û yan derheq gellek pirsên pêwendîdar bi vê mijarê de, ku hekî em nebêjin bo hertim, lê bo 10 yan 15 salên din, pêşiya vegeşandina fena navikî tê girtin.

**Pirs: Lê rakirina dorpêçan ew jî di vê rewşa xirap ya aborî de, ku rejîma Îranê tê de ye, dikare riheke din bixe ber laşê şepirze yê Îranê, boçûna we çi ye?**

**Bersiv:** Diyar e ku ew rewşa aborî ku we bas kir, vedigere bo wê demê

ku ew jihevtêgihîştin (tefahomname) heya sê mehên din bigihîje lihevkirineke giştgîr, bi hûrdekariyên xwe ve, wê demê jî zehmet e ku ew dorpêçên aborî bi tewahî bêne rakirin.

Lê asayî ye ku hekî dorpêçên aborî qonax bi qonax jî bêne rakirin, bandora wan ya erênî li ser rejîma Îranê hebe, lewra nabêjim Îran, û dibêjim Komara Îslamiya Îranê, ji ber ku aboriya Îranê kêmtir di xizmeta xelkê Îranê de ye, û zêdetir di xizmeta dem û dezgehên parêzerê vê rejîmê de ye.

Lê bi vî halî jî rakirina gemaroyan heya qasekî kêm, bandora xwe li ser bazar û bijîva xelkê dadinê, eva di demekê de ye ku arîşeya sereke ya xelkê Îranê û neteweyên wî welatî digel rejîma Îranê kêmtir madî û me'îşetî ye, belkû zêdetir siyasî û nebûna azadî û doma maf binpêkirina rejîmê ye ku wisa xuya nake ku piştî vê lihevkirinê jî ku di rê de ye, guhertinên erênî û vekirina siyasî li pey xwe hebe, berevajî ceribandinan nîşan daye, ku hindî ku rejîma Îslamî ya Îranê di hemberî cîhana derve û welatan de paşekêşê bike, zext û givaşa li ser xelkê navxwe û azadîxwazan jî zêdetir dike.

Her çawa ku rejîm amade bû ku di hemberî welatan û cîhana derve de serê xwe bitewîne, hekî her bi vî awayî jî serê xwe bo daxwaziyên siyasî tewandiba, me dikarî ku bêjin guhartin di rejîma Îslamî ya Îranê de pêk hatiye, û jiyana xelkê guhertineke erênî bi ser de hatiye.

**Pirs: Te bas ji vê kir ku baştirbûna rewşa aborî, zêdetir rejîma Îranê mifahê jê werdigre heya xelkê Îranê, mebesta we çi ye?**

**Bersiv:** Merema min ew e ku rejîma Îranê, pitir ji xelkê Îranê girîngiyê dide siyaset û kiryarên xwe, û samana welat jî di heyama temenê xwe de bo vê armancê bi kar aniye, lewra baştirbûna rewşa aborî ya rejîmê, destê rejîmê vekirî dihêle, di alîkarîkirina bi deste û girûpên tundrev di herêmê de, û girûpên terorîstî, û destêwerdana zêdetir di nav karûbarên welatan de, û tevdanîkarî û têkdana ewlehiya herêmê.

Em hêvîdar in, ku her çawa ku civaka cîhanî û welatên 5+1 girîngî dane çeka navikî ya Îranê, û derheq destpêregihîştina rejîma Îranê bi çeka navikî hest bi metirsiyê kirin, û di encam de ew neçar bi serîtewandina di hemberî şert û mercên xwe de kirin, lê her bi vî rengî jî girîngiyê bidin mafên mirovan, û maf û azadiyên neteweyên Îranê û aramiya herêmê, û her bi vê micidbûnê jî, rejîma Îslamiya Îranê bixin jêr zext û givaşê, û neçar bi serîtewandina di hemberî azadiyên xelkê Îranê û aramiya herêmê de bikin.

**Pirs: Bi awayekî giştî hekî ew jihevtêgihîştin (tefahomname) bibe lihevkirin, û lihevkirineke yekcarî jê bikeve, û di çarçoveya lihevkirinê de dorpêçên aborî bêne rakirin, gelê wê bandora erênî li ser pêwendiyên rejîma Îranê digel rojava hebe?**

**Bersiv:** Bi rakirina gemaroyan heya pile bi pile jî, pêwendiyên ticarî ên welatên Rojavayî, digel Îranê wê zêde vegeşin, renge digel wan welatên ku rejîma Îranê heya niha bi çavê neyar lê nihêriye, kêmtir yan direngtir, û digel wan welatên ku rejîma Îranê asayî reftar bi wan re kiriye, zûtir yan zêdetir. Asayî ye jî ku ew pêwendî di warên din de jî bi bandor bin.

**Pirs: Bi berçavgirtina vê rewşê, û piştî lihevkirina yekcarî ya welatên 5+1 digel rejîma Îranê, hûn rewşa tevgera Kurd û xebata xelkê Kurdistanê çawa dibînin?**

**Bersiv:** Xebata rewa ya Kurd û xelkê Kurdistana Rojhilat, û heya ew azadîxwazên Îranê ku di destpêkê de li ser naveroka kevneperestane û dijî demokrasî û dijî mafê neteweyî guman tunebûne, û her ji destpêka bidestvegirtina deshilatê ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve dom hebûye, niha jî berdewam e, û nahê girêdan bi pêwendiyên rejîma Îranê, digel her cihekî din, heya hekî ew pêwendî bi erênî yan nerênî jî bandor wan hebin.

Pirsa demokrasî, mafê neteweyî, dadperweriya civakî wekheviya mafê jin û mêr di malbat û civakê de, di gel naveroka rejîma Îranê yek nagrin, û di çarçoveya vê rejîmê de desteber nabin, lewra heya hiloşîna rejîma Îslamî û astengî pêkanîn li ser riya dabînbûna wan mafan, xebata azadîxwazan û neteweyên Îranê, û li serveyî hemiyan neteweya Kurd di kurdistana Îranê de, berdeqwam dibe, û bi piştevaniya civatên xelkê Îranê û azadîxwazan piştqahîm dibe.

**Doma R:3**

heq destêwerdana di nav karûbarên welatên herêmê de, û alîkarîkirina digel dost û hevalbendên xwe di herêmê de, wate rejîma Sûriyê, Hizbullaha Lubnan, Husiyên Yemenê, û girûpên din ên terorîstî di gellek cihên cîhanê de. Lê ew vegeşîna aborî ew nabe, ku hinek ji çavdêran behsa wê dikin, ku ew jî vedigere ser du sedemên sereke:

1-Nirxa petrolê her niha gellek daketiye, û bi şandina petrola Îranê bo bazarê, renge zêdetir jî nirxa wê dakeve, û ji bo zêdetir hilincan û zêdetir şandina petrolê jî hewcehî bi heyameke zaf heye ji bo nûjenkirina çalên petrolê. 2- Sîstema birêvebiriya aborî di bin deshilata Komara slamî de wekî hemû beşên din, sîstemeke kêrnehatî ye, û wê sîstemê hêz û şiyana vegeşîna aboriyê tuneye. Lê piştre dibe em çavnihêrê guhertinên din jî di rewşa herêmê bin ku ew jî vedigere ser wan xalên veşartî ku di daxuyaniyê de nehatine nivîsandin û renge piştî lihevkirina dawiyê jî, xelk jê nehêne agehdarkirin.

**Têbînî: Çavkaniyên zanyariyên vê gotarê ji wan mijaran hatine wergirtin, ku ji aliyêl Amerîkayiyan ve hatine weşandin.**

# Jeniral Dimpsî: Amerîka agehdarî firotina S-300'an bi Îranê bû

**Serokê Nawenda Hevpar a Hêzên Çekdar ên Amerîkayê dibêje ku firotina pedafendên S-300 bi Îranê tu bandorekê li ser vebijêrkên leşkerî yên ku egera bikaranîna wan li dijî Îranê heye, tunabe.**



Jeneral Martîn Dimpsî di civîna xwe ya hevpar ya bi Işton Karter Wezîrê Parastina Amerîkayê re, ragehand ku: "Bi sala ye em agehdar in ku Rûsiye dixwaze sekoyên dijî mûşekî bifiroşe Îranê, û me di nirxandinên xwe de, hemû aliyekî vê pirsê daye berhev".

Navbirî derheq vê pirsa nûçegihanan ku gelo ew mûşek nabin sedema vê ku Amerîka egera bikaranîna vebijêrka leşkerî li dijî Îranê rake, got: "Vebijêrka leşkerî ji bo hewldana zêdetir ya di warê dîplomasiyê de ye, û hekî dîplomasî têk here, wê demê ji bo pêşîgirtin û xatircembûn ji destpêrenegihîştina Îranê bi çeka navikî, ew vebijêrk her li ser cihê xwe wê bimîne".

Navbirî derheq rola Îranê jî di Yemenê de got ku Îranê pêwendî bi Hosiyan re heye, lewra Erebistanê mafê vê yekê heye ku nîgeran be.

Wezîrê Parastinê jî derheq rola wezaretxaneya xwe û erkên wê di biyavê pirsa etomî ya Îranê de got: "Rola me encamdana gotûbêjan nine, belkû girîngîdan bi du pirsên dinê ye. Karê me yê yekemîn herwekî serkomar ragehandiye, xatircembûna ji parastina vebijêrkên din ên li ser maseya gotûbêjan e, û karê me yê duyem jî berdewamî li ser pêkanîna tenahiyê di tewahiya herêmê û berdewambûna me li ser bihêzkirina şiyanên hevalbendên me ye".

www.arsivakurd.org

# Herifandina kesayetî û şunasa neteweyî bi pêkenokan



**Şemal Terxîbî**




Mirov tenê jîndarê li ser topa erdê ye ku dikare ji riya keniyê ve hem hesta mirovane ya xwe eşkere bike, hem jî barê giran yê nexweşiyên jiyanê di nav hindurê xwe de sivik bike.

Baskirina serpêhatiyên xweş, tameke taybetî dide rûniştinên di nav civakê de, û herwekî civaknas û derûnnas îşareyê pê dikin, vegotina qiseyên xweş dikarin li ser vegeşîna hêza civakî bandora xwe ya erênî danên, lê hinek caran ew qiseyên xweş sînorên xwe yê rastîn dibezînin û dikevin nav xaneya henekkirinê (mesxerekirinê, bêhurmetîkirinê), ku şûnwarên neyînî li paş xwe bi cih dihêlin, û bandora xwe li ser pêwendiyên di navbera takên civakê de dadinên.

Di Îranê de ew qiseyên cihê keniyê ku wekî cok (pêkenok) têne nasîn, heya qasekî berçav girêdayî bi henekê xwe kirina bi neteweyan û zimanên wan, yan girûpên civakî û zaravên wan, û regezên jin û mêr, û meseb û baweriyên olî û ...hwd ne, ku naveroka piraniya herî zaf ya wan cokan (pêkenokan) pêk tê ji bêaqilî, paşveman, hovîtî û ...hwd, û ew aliyên ku berdengê wan pêkenokan in. Ya ku di vir de cihê basê ye, bersivdan e bi wan pirsyaran:

Gelo destpêka serhildana piroseyê di Îranê de vedigere bo çi demekê? Sedem yan sedemên zêdebûna vê diyardeyê çi ne? Bandorên vê pirsê li ser pêwendiyên takên civakê çi ne? Gelo ev piroseya bi awayê sîstematîk bi rê ve diçe, yan dibe wekî diyarokek civakî û pirseke carr çav lê bihê kirin?

Bona bersivdana bi van pirsyaran di berahiyê de, dibe vê pirsyarê em bixin rû, ku Îran bi sedema zalbûna çendîn rejîmên dîktator di çend sedsalên borî de, ku derfeta eşkerekirina boçûnan gellek kêm bûye, û civakeke xemok û daxistî ye, firsenda eşkerekirina "şunas" û "hebûnê" tê de nahê xuyakirin.

Wate derfet bona vê ku xelk bikarin di xweşî û şahiyan de beşdar bin gellek kêm e, û bi vê sedemê jî ew hewcehiya derûnî ji riyên cok (pêkenok) û henekan ve eşkere dikin. Renge di vir de em nekarin dîroka rast û dirust ya serhildana vê diyardeyê di Îranê de bixin rû, lê bi xatircemî ve destpêka bi sîstematîkkirina pirsa darêtina pêkenokan li dijî neteweyan û zimanên wan vedigere bo wê demê ku deshilatdarên Îranê, siyaseta asîmîlasyon û yekdestkirina gelên Îranê girtine pêş (dewrana Pehlewî).

Ew pêvajo bi dirêjahiya çend dehikên borî, û bi taybetî piştre jî digel bidestvegirtina deshilatê ji aliyê rejîma Îslamiya Îranê ve, formeke din ya taybetî bi xwe ve girt, û di rastî de bû emrazê di destê dewletê û hikûmetên yek li pey yekê, da ku bi vî rengî bikarin cudahizran û ayînza û neteweyên cuda ji nawenda Îranê, berbirûyê dûrxistina ji nasnameya takekesî û di heman demê de jî, şunasa bi kom bikin, û xwe bi kêmzanînê bikin hêvinê gihîştina bi armancên sereke ku heman vemirandina hesta nasnamexwaziyê û serbixweyiya nasnamê ye.

Ew pêvajo hinek caran ji riya dem û dezgehên piropagendeyî, û carina jî ji riya pirtûkên xwandinê, û carina jî ji aliyê berpirsyarên hikûmetî û deshilat bi destan ve, di kombûnên şexsî û giştî de hatiye cî bi cî kirin, lê xala balkêş û cihê mixabiniyê ew e ku hinek caran bi nav rewşenbîrên ser bi wan netewe û ayînzayan bi zanebûn yan jî bi nezanebûn, wan diyardeyan vedigeşînin, û di bin navê "qiseyên xweş" û "bo bêhnvedana mejî", bêhurmetiyê bi aliyekî din dikin, û bi xatircemî ve ew pêkenokên ku ji bo Kurdan, Azeriyan, Ereban, Reştiyan, û Loran di Îranê de çêdikin, ji bo geşekirina hizra siyasî û civakî ya wan nine, û hewldanek e bo sivikatîkirin û lawaz nîşandana hêz û şiyanên mirovî û me'newî yên wan, ku renge yek ji armancên wê, hêcetanîn be bo vê siyaseta ne dadperwerane ku di warê geşeya aborî û siyasî û çandî de, di wan herêman de berçav hatiye girtin, ku herêmên neteweyên Îranê ne.

**Di Îranê de ferq û cudahîdanîn û sivikatîpêkirineke rêkxistî bo neteweyên xeynî Fars heye, ku herwekî me îşare pê kir, xwe xistiye nav pirtûkên dersî de jî.**

Di Îranê de ferq û cudahîdanîn û sivikatîpêkirineke rêkxistî bo neteweyên xeynî Fars heye, ku herwekî me îşare pê kir, xwe xistiye nav pirtûkên dersî de jî. Ji dîtingeha ol ve jî herwekî ku heya niha hatiye dîtin, pêgeha peyrewên ayînên cuda ji mesebê fermî ye, ku bi giştî di destê ferq û cudahîdanînên bi eşkere de dinalin. Bi xatircemî ve ew cure siyaset komek şûnwaran jî li pey xwe bi cih dihêlin ku renge beşek ji şûnwarên wan henekpêkirinan bi van awayan bin:

Yekem, bandora vê rewşê pêk tê ji lawazbûn û heya veqetiyana pêwendiyên giştî, di nav civakê de, ku bi xwe garantiya pêkvemanê û lihevkirina tex û qatên civakê dikin. Wate bi lawazbûn û nemana vê hevpêwendiyê, pêkenok cardin berhem tên, û pêwendiyên mirovî zêdetir ber bi lawazbûnê ve dibin.

Di asta takekesî de jî dikare bêbaweriyê pêk bîne, ku encam heman ji xwe bîhanîbûn e ku kêşeya herî mezin li ser riya vegeşîna çandî û civakî tê hesibandin. Bo mînak hekî bandora vê pêvajoyê li ser neteweyekê bigihîje astekê ku hest bi şerm û bîhanîbûnê bike, tu palderek namîne ku nivşên piştî wan bo parastina deb û nerît û çanda gelê xwe pal bide, ku ew pirsa jî di cihê xwe de dibe sedema sazbûna nivşeke bêhêvî û dûr ji bawerkirina bi xwe.

www.arsivakurd.org

# Nerîna Lîderan



John Kerry

**“Haya me ji te heye tu çi dikî!”.**



Mistefa Hicrî

**“Îran vegeriya bo xala sifrê”.**



Bulint Arînç

**“Kurdên Tirkiyê zêdetir bawerî bi AKP’ê hene, heya HDP’ê”.**



Cebar Yawer

**“Pêşmerge %95 ji herêmên Kurdistanê ji bindestê DAÎŞ’ê azad kiriye”.**

## Mohreyên bîhanî di şerê Îslamîstan de



**Selam Îsmaîlpûr**




www.arsivakurd.org

Komara Îslamiya Îranê berî vê ku deshilatê bi dest ve bigre, bi pêşvegirtina siyaseta şandina derve ya şoreşê, û piştevaniya ji tevgerên bi nav xelkî û rizgarîder, û di rastî de girûpên terorîstî û hewldan bona nifûza nerm di nav xelkê wan welatan de, kariye ku pêgeha xwe di her yek ji wan welatan de ji xwe re bibîne, bi awayekî ku bikare berjewendiyên xwe di herêmê de bi xerc û hêza mirovî ya welatên ku armanca wê ye, û di nav xaka wan welatan de cî bi cî bike.

Bi vê sedemê welatên wekî Tirkiye, û Erebistan û welatên din ên Erebî ku direngtir ji Îranê bîr ji vê mijarê kirine, niha bi çûna rasterast bo şerên herêmî li dijî hevalbendên rejîma Îranê, di rastî de bêy pevçûna rasterast digel Îranê, vê rejîmê û ji vê jî girîngtir hinek beşên din dikin dijminê xwe.

Ew pirsa zêdetir ji vê cihê ve çavkanî digre ku hikûmetên Erebî di van salên dawiyê de tu carî bi awayekî micid bîr ji nifûza di nav girûpan û tex û qatên cur bi cur ên neteweyên xwe û cîranên xwe de nekirine, û zêdetir hewl dane ku di nav berhevdanên herêmî de, piştevanê rejîmên nedemokratîk ên wekî xwe, di hemberî zextên navxweyî û gefên navxweyî de bin.

Lewra niha rejîma Îranê dixwaze ku bi lîstina bi Hosiyan di Yemenê de (wekî peyayên şetrenca xwe) hikûmetên Erebî yên herêmê neçar bi bikaranîna arteşên xwe yên kilasîk (wek hesp, fîl û wezîrê şetrencê) û kişandina wan bo nav şereke partîzanî bike, ku serkevtina hevalbendiya Erebî tê de gellek dûr ji çavnihêriyê ye.

Ji aliyekî din ve zirarên giran yên Hosiyan (bi taybetî yên sivîlan) di şerekî bi vî rengî de, tevî vê ku zirareke wisa rasterast nagihîne Îranê, dikare barê berpirsayetiyeke siyasî û mirovî ya giran bixe ser milên hevalbendiya Erebî, û bi derbazbûna demê raya giştî û herêmî û helwestên civaka cîhanî berbirûyê wan bike.

Bi vî rengî hevalbendiya Erebî nikare ji Tirkiyê jî, alîkariyê bixwaze, ji ber ku ne Tirkiye û ne jî endamên hevalbendiya Erebî, xwediyê hevalbendên wekî hevalbendên Erebî yên Îranê di Rojhilata Navîn (Şî’eyên Îraqê, Rejîma Sûriyê, Hizbullaha Lubnan, Hosiyên Yemen, û heya Şî’eyên Behrîn û Erebistanê) nînin ku xwediyê hevbendiyeke hizrî ya qahîmtir bin.

Ew rejîmên Erebî li ser dijminatiya eşkere bi Îslama siyasî re, çi ji cura AKP û Îxwan, yan jî ji cura selefiyên cîhadî, û çi jî ji cura Şî’eya wê hizreke hevpar hene. Niha li ser erdê, ew girûpên girêdayî bi Îslama siyasî ne ku lîstikvanên herî nû yên guherînkariyan û şerên vê dawiyê yên Rojhilata Navîn in, û rejîma Îranê bi xwe beşek ji vê lîstokê ye, û li ser erdekî bi vî rengî xwediyê gellek ceribandinan e, û rejîmên sekolar û helbet nedemokratîk ên Erebî piştevanê rastîn yên tu yek ji tevgerên bihêz yên naskirî bi îslama siyasî nînin, û pêgeha wan di nav wan lîstikvanan de tuneye.

Di Sûriyê de jî girûpên wekî DAÎŞ’ê niha piraniya herêman di destên wan de ne.

Di Yemenê de jî arîşeya Erebistanê eva ye ku nizane ku piştî bombebaranên esmanî li dijî Hosiyan û arteşiyên girêdayî bi Elî Ebdullah Salih, li ser erdê dibe ji kîjan girûpan piştevaniyê bike, ji ber ku girûpên din yên bi bandor pêk tên ji Elqaîdeya Yemenê, û Hizba Îxwanî (Îslah) ku herdu jî ji dîtingeha Erebistana Se’ûdî ve, wekî girûpên kêrnehatî têne hesibandin, û eva di demekê de ye ku Îran di nav Yemenê de, hevalbendên bihêz wekî Husiyan hene, û heya Tirkiye jî ku alîkariyeke zaf bi şoreşa Sûriyê re kir, wisa tê dîtin ku nikare zêdetir piştevaniya neyarên Beşar bike, da ku dijberiya Îranê bikin, ji ber ku hekî wisa bike hevalbendên Amerîkayî yên xwe wê ji dest bide. Serbarê hebûna sînorên dûr û dirêj di navbera Sûriyê û Tirkiyê de vî welatî hêla ew cur’et tunebûye ku hêzên xwe yên leşkerî bike nav Sûriyê de.

Di demekê de ku Îranê ji hezaran kîlometran dûrtir yekîneyên pasdarên xwe şandine Sûriyê, û di şerên li Îraq û Sûeriyê de beşdar e, û dikare ji riya Sîstanî, Beşar Esed û Nesrullah û Husiyan ve xelkê bikêşe nav pevçûnan de. Di rewşeke bi vî awayî de, karê rikeberên herêmî ên rejîma Îranê ji bo kêmkirina nifûza rejîma Îranê di herêmê de, bi bê guherîna stratejiya kevn wate “hevalbendiya bi rejîmên herêmê re, ne hewldan bo çûna nav xelkê herêmê de”, wê karê wan gellek dijwar û îza bike.

**Fatime Mihemedpena: "Birîna herî giran û bi êş a jiyana min ku bandorek nerênî xistiye ser min, roja şehîdketina du birayên min bi navên Husên û Salih Mihemedpena bûn, ku di nava refên pêşmergên PDKÎ de canê xwe gorî kirin".**

**H: Arif Vêlzî**

Bawerî bi xwe bûn, û hebûna îradeyek bihêz û şoreşgêr li kêleka fîdakirina tewahiya hez û xweşiyên jiyanê bê tu çavnihêriyekê, di pêxema azadî û serbestiya neteweyeke zulmlêkirî de, bûye sedem ku şêrejinên Kurd li Kurdistana Rojhilat û di nava refên pêşmergên PDKÎ de, serbarê wan hemû salan derbiderî û awareyî û herweha di bin êrîş û topbaran û girtin û kuştin û terorên cur bi cur de, hêj bi zimanek sade û baweriyek asinîn û pir ji hêvî, dibêjin "Em şanaziyê bi rêbaza xwe ku heman rêbaza şehîdên serbilind ên Kurdistanê ye dikin, û heya gehîştin bi armancên gelê xwe, wê jiyana ji vê jiyanê zehmetir jî bi dil û can qebûl bikin".

Fatime Mihemedpena keça Mihemed û neviya Emer Paşa yek ji wan şêrejinan e ku, sala 1956'an (1335) li gundê Qeleres a ser bi bajarê Serdeştê hatiye dinê.

Fatime Mihemedpena di despêkê de derheq bi çavaniya nasyarî û tevlîbûna xwe bi refên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û herweha jiyana xwe ya hevpar, weha bi rojnameya Agirî re daxive: "Di rastî de min ji riya malbata xwe ve, rê û rêbaza PDKÎ nas kir, jiber ku malbata min bi salan e ku xebatkarên rêya azadî û serbestiya Kurdistanê ne, û têkiliyên wan tevî PDKÎ hebûne. Lewra min her di zarokî de Partiya Demokrat nas dikir, lê di Sala 1977'an (1356) de min jiyana hevpar tevî Xidir sedaqet pêk anî. Tenê piştî çend mehan şoreşa gelên Îranê serî hilda, û Xidir tevlî refên PDKÎ bû û çeka şeref û berxwedanê kire milê xwe de, û ji wî çaxî ve heya niha me jiyana xwe ya hevpar serbarê wan hemû zehmetî û awareyiyê, di nava refên kadir û pêşmerge û malbatên PDKÎ de derbas kiriye û berhema jiyana me jî şeş zarok in ".

Fatime Mihemedpena weke jinek fîdakar û xwedî îman bi rêbaza şehîdan, piştî derbazkirina zêdetir ji 35 sal jiyana nava şoreşê û Kurdatiyê de, çavnihêriyên xwe ji PDKÎ û hevjînê xwe Xidir weha tîne ziman: "Çavnihêriya min weke hevjîna pêşmergeyekê ev e ku hizba min wefadar û emegnas be bi rêbaza şehîdan û hertim vê rêbazê bidomîne. Herweha çavnihêriya min ji Xidir jî ev e ku ji vê rêbazê dernekeve û destan ji rêbaza şehîdan nekişîne. Xêncî vê çavnihêriyê, min tu çavnihêriyek din ji Partiya Demokrat û hevjînê xwe nine".

Fatime Mihemedpena piştî zêdetir ji 35 sal jiyana siyasî di awareyiyê de, bi çavên pir ji hêvî ve roja herî xweş a jiyana xwe weha tîne ziman: "Roja herî xweş a jiyana min mixabin hêj nehatiye(Rizgariya Kurdistanê). Herweha ji vê rojê ve ku me rêbaza PDKÎ hilbijartiye heya niha, me tu caran rûyê xweşiyê nedîtiye û hertim jiyana me di awareyî û derbideriyê de derbaz bûye, lê girîng ev e ku min di salên borî de û niha jî ew rêbaz domandiye, û di pêşerojê de jî, wê her şanaziyê bi vê rêbazê bikim û vê rêbazê bernadim".

Fatime Mihemedpena herweha derheq bi roja herî nexweş a jiyana xwe dibêje: "Jiyana pêşmergatiyê jiyaneke pir e ji zehmetî û nexweşî, lê çend roj di jiyana



min de hene ku pir nexweş in, û tu caran ji bîra min naçin, û bi şev û bi roj, her yek ji wan bi xwe û di cihê xwe de min dilgiran û nerihet dikin.

Roja herî nexweş û birîna herî giran, roja jidestdana rêberên navdar ên Kurd Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî ne. Piştî jidestdana wan du rêberan, birîna herî giran û bi êş a jiyana min ku bandorek nerênî xistiye ser min, roja şehîd ketina du birayên min bi navên Husên û Salih Mihemedpena ye, ku di nava refên pêşmergên PDKÎ û rêbaza Qazî û Qasimlo û Şerefkendî de canê xwe gorî baregehên azadî û serbestiya Kurdistanê kirin".

Fatime Mihemedpena di dawiyê de rû li xelkê Kurdistanê dike û bi vê gotinê dawiyê bi hevpeyvîna xwe tîne: "Ez daxwazê ji xûşk û birayên xwe li Kurdistana Rojhilat dikim ku refên PDKÎ bigrin pêşiya xwe û destan ji piştevaniya partiya xwe bernedin".



www.arsivakurd.org

## Keçeke xwendekar a Kurd kete nav refa hilbijartiya Karateya Îranê de

**Li gora nûçegehaniyan, keça werzişvan ya bi navê Zara Rezayî, xelkê bajarê Bokanê bo refa hilbijartiya Karateya Îranê hatiye diyarîkirin.**

Eva yekemîn car e ku werzişvaneke kurd ku xelkê bajarê Bokanê ye, bo nav refa hilbijartiya Karateya Îranê tê gazîkirin.

Ev keça werzişvan piştî vê ku li berberekanêya kêşa jêr 68 kîloyî, ku li Şîrazê bi rê ve çû beşdarî kir, karî here nav refa hilbijartiya karateya Îranê de. Zara Rezayî ku xwendekara beşa pizişkî li zankoya Tewrêzê ye, yekemîn keça werzişvan a parêzgeha Urmiyê ye ku kariye here nav refên hilbijartiya karateya Îranê de.

Her di vê pêwendiyê de meha derbazbûyî xatûna Nîgar Husênî werzişvana kurd û xelkê bajarê Sine weke fêrkarê (rahênerê) hilbijartiya karateya Îranê hat diyarîkirin.



## Têkwandokarekî Kurd pileya yekemîn di Asiyayê de bi dest ve anî

**Kurdistanmedia: Mihemed Xanî, têkwandokarê kurd û xelkê kirmanşanê di kêberkêya Asiyayî ya Çîna Taype de, mîdala zêr bo xwe bi dest ve anî.**

Li gora nûçegehaniyan, têkwandokarê kurd xelkê bajarê Kirmanşanê di kêberkêyên pomseya qehremaniya Asya ku di du temenên cuda de "zarok û nûciwan" bi beşdariya 127 têkwandokaran li 17 welatan û li hola zanîngeha Taype ku di welatê ÇînaTaype de bi rê ve çû, pileya yekem bi dest ve anî. Eva yekemîn gera pêşbirkêya qehremanê Têkwandoya Zarokên Asiya "giyorogî" bû ku li 25.01.1394 (14'ê Nîsanê) li Çînê dest pê kir, û heya 27.01.1394'an (16'ê Nîsanê) dom hebû.






## Beşdariya jinan di yarîgehan de pirseke sereke nine



**Nûnereke Civata Şêvra Îslamî ya Îranê ragehand ku beşdariya jinan di yarîgehên werzişî de pirsek ne sereke ye, û bona pejirandina her biryar û peyreweke navxweyî di vê derheqê de, hewce ye ku boçûna zanayên ayînî bête berçavgirtin.**

Lalê Êftixarî ku endama Heyeta Rêveberî a Komisyona Çandî a Civata Şêvra Îslamî ya Îranê ye, di gotubêjekê de tvî nawenda nûçegehaniya "Xanêyê Mêlet" ragehand ku Wezareta Werziş û Wezareta Navxwe(Kêşwer) niha mijûlî çêkirina biryarnameyekê ne bona beşdariya jinan di yarîgehên werzişî de. Her du heftî berî niha cîgirê Wezareta Werziş û Ciwanên Îranê bas ji pejirandina gelaleyekê ji aliyê "Şêvra Ewlehî" derheq bi beşdariya malbat û jinan di yarîgehên werzişî de kir, lê piştî demek kêm deshilata Îranê gotinên navbirî bi nersat dan zanîn û ret kirin.

Eva di demekê de ye ku beşdariya jinan di piraniya pêşbirkêyên mêran de qedexe ye ku tenê hindek caran û di hindek yarîgehan de jinên bîhanî karîne ku beşdariyê tê de bikin.

## Hîlarî Kilînton bûye armanca êrîşên torên civakî

Piştî belavbûna nûçeya xwe berbijêrkirina Hîlarî Kilînton a 67 salî bona posta serkomariya Amerîkayê, navbirî di torê civakî de ket ber êrîşê û jin bûn û temenê wê bûye henekên karberên Întêrnêtî.

Henekên weke "Herackirina %30 a kincên jinan", "Ew kete erdê, û nekarî cardin rabe ser piyan", "Here kirasê mêrê xwe otî bike", Ew dibêje "Dengên xwe bidin min, jiber ku zêdetir ji her berbijêrek din Hormonên mêran di leşê min de hene" , Hîlarî dibêje "469 sal temenê min e, helbet li gorî salên Seyan" li ser Hîlarî Kilînton di torên civakî de hatin nivîsandin.

Eva di demekê de ye ku di navbera wan karberan de, gellek kes hebûn ku bi zimanê Farsî jinbûn û temenê Hîlarî Kilînton kiribûn armanca henekên xwe û nivîsandibûn :

"Hekî Hîlarî bibe serkomar, wî çaxî Kilînton wê bibe xanima yekem a Amerîkayê", "Xaltîk Hilarî destan ji siyasetê bikişîne û di vê dawiya temenê xwe de here û bigihîje jiyana xwe", "Dengê Tevrê kolîna qebrê Hîlarî tê", "Hekî Hîlarî di malbata xwe ya biçûk de karîba rêveberiya Kilînton bike, bi vê derbazbûya evîndariyê, hinek zêdetir wê xizmeta civaka Amerîkayê kiriba".



# Gotinên Navdaran



**A: Firat Ceweri**

Jinek an hez dike, an jî nefret dike, nîvê wê tune ye.

**Syrus**

Gelek ji jinan mîna resimên xwe ne ciwan in.

**Sir Max Beerbohm**

Yê pisîkan neh ruhê wan, yê jinan jî bi qasî neh pisîkan ruhê wan heye.

**Fuller**

Di dinyayê de tiştê ku pir tê guhertin awayê porşehkirina jinan e.

**Addison**

Ji keçek xerab jina baş dernakeve.

**Benjamin Franklin**


Liberketinên jinan wek bahozên havînan e; xurt e, lê kurt e.

**Joanna Baillie**

Jin çavên ku her tiştî dibîne jî, dixapîne.

**Dostoyevskî**

## Ferhenga termên matematîkê derket




**Ferhenga Termên Matematîkê bi amadekariya Dilawer Zeraq û Mem Wenda derket.**

Ferhenga Termên Matematîkê, di 4 salan de hatiye amadekirin. Di beşa yekem de, term (navên têgihî) wekî kurdî-fransî-îngilîzî-almanî-tirkî hatine rêzkirin. Di beşa duyem de jî term, wekî; tirkî-kurdî hatine rêzkirin.

Dilawer Zeraq derbarê ferhengê de ji Rûdawê re wiha got: "Amadekirina Ferhenga Termên Matematîkê, di sala 2011'an de dest pê kir.

Di binavkirina termên (navên têgihî) ên matematîkê de, me car caran mentiqa Kurdî car caran jî mentiqa Matematîkê da pêş, û di ser wan re term û nav ava kirin. Herwiha çiqas ji destên me hat, me xwe gihande xebatên ku berî xebata me hatine kirin, û me mifah ji wan wergirt".

## Xelatgirê Nobelê, "Guenter Grass" koça dawiyê kir


**Xelatgirê Xelata Nobelê ya Edebiyatê, "Guenter Grass" di temenê 87 saliyê de, li nexweşxaneyeke bajarê "Luebeck"ê li bakura Almanyayê wefat kir.**

Ev yek îro ji aliyê weşanxaneya "Steidl Verlag" hate piştrastkirin.
Guenter Grass wekî yek ji girîngtirîn nivîskarên Almanî yê piştî şerê duyemîn yê cîhanî dihate hesibandin.


Di sala 1959'an de yekemîn romana wî "Die Blechtrommel" (Dahol) derket, û bi wê romanê "Guenter Grass" li seranserê dinyayê hate naskirin. Di sala 1999'an de, Guenter Grass ji bo xebata xwe ya wêjeyî xelata nobelê ya Edebiyatê wergirt.

"Guenter Grass" dostekî nêzîk yê nivîskarê Kurd Yaşar Kemal bû, û li derheq siyaseta Tirkiyê di hemberî Kurdan de, gellek caran Tirkiye rexne kiribû.

"Guenter Grass" herwiha hikûmeta Almanyayê jî ji ber firotina çekan bi Tirkiyê rexne dikir, û bal kişand ser vê yekê ku ew çek di hemberî Kurdan de têne bikaranîn.
"Guenter Grass" di sala 1927'an de, li bajarê "Danzîgê" yê îro li Polandayê ji dayîk bibû.



## Pirtûka jînenîgariya Kadrî Cemîlpaşa




**Jiyana Kadrî Cemîlpaşa ku neteweperestekî sedsala 20'emîn ê kurd e, bû pirtûk. Pirtûk behsa têkoşîna siyasî ya kurdan a sedsala 20'emîn dike.**

Pirtûk ji aliyê Selahaddin Ugur ve bi zimanê tirkî hatiye nivîsandin, û weşanxaneya Avestayê ew çap kir.

Pirtûk behsa guhertinên ji destpêka sedsala 19'an ve dike, ku biyavên siyasî û civakî yên kurdên di nava sînorên Osmaniyan de bi xwe ve digre. Di vê çarçoveyê de li ser jiyana Kadrî Cemîlpaşa disekine.

Di nasîna pirtûkê de wiha hatiye gotin: "Di destpêka sedsala 20'emîn de neteweperweriya kurdî hedî hedî rû dide."

## Pirtûka "1915, Komkujiya Ermeniyan" derket

**Nivîs û lêkolînên Rohat Alakom ên li ser Ermeniyan di pirtûkeke bi navê "1915 Komkujiya Ermeniyan" de hatin komkirin, û ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve hate çapkirin.**

Sala 1915'an saleke reş e ji bo Ermeniyan. Ji milyonekê zêdetir Ermenî ji erdên xwe hatin dûrxistin, û bi darê zorê ji Anadoliyê hatin derxistin. Bi hezaran hatin kuştin, yan jî di rê û çolan de mirin.

Îro tê gotin di komkujiya Ermeniyan de dewleta Osmaniyan suçdar e. Hêzên dewletê, hêzên fermî ev pilan birine serî, û derbasî piratîkê kirine.

Rohat Alakom di vê xebata xwe de çend rûpelên cuda, ji wê dîroka tarî, û çend bûyerên balkêş ji wan salên êşê radixe ber çavan.




www.arsivakurd.org

# Zimanê Kurdî


Beşa 4. Dema nivîsînê

Valahiyên jêrîn dagirin

Ez bi..........................................................................................xwe tiştan dibînim.

Ez bi pozê xwe...........................................................................................dikim.

Ez bi guhên...................................................................................................

Ez bi...........................xwe xurekan dixwim û vexurekan..................................

Ez bi...........................................................................................xwe xurekan dicûm.


Beşa 5. Dema lîstikê

Bêjeyên jêrîn di xaçepirsê de bibînin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Z | C | E | H | W | M | L | S |
| T | A | P | Ç | A | V | S | L |
| F | L | A | M | I | L | E | Ê |
| Ê | I | T | I | L | Î | R | V |
| Û | N | I | R | Û | L | Î | E |
| Q | G | K | E | M | D | E | V |
| J | Î | M | I | J | A | N | G |

LÊV

DEV

PATIK

MIL

LING

RÛ

SER

TILÎ

ÇAV

MIJANG

www.arsivakurd.org

# Tiştonek



A: Mahir Berwarî

1- Yê girêday qelew dibit, yê vekirî zeîf dibit.
- Qesra xodê danî, benî ya der lê vekirî.

2- Herec herec, her êkê 15 derec.
-Helec e malec e, bîst û pazd e derec e.

3- Qotu qotu di destî da, singê sur e di pindê da.

4- Hespê sipiye, bijî şîn.
- Gayê dilo, heftê cilo.
- Ho kilo, heft qat cilo.
- Ser seyd e, şaşik şîn. (* kesik)
- Li bin erdî pata dikit.
- Goka mina sor, têde hene heft çermên spî bi dor.
- Gayên nin e, sor hen e, heft çermên wan hen e, tu dizanî ew çi ne?

5- Mamkê mino, mamkuk e, ya bi kiras û dersuk e, navê wê ziçepuk e.
- Babê te yê mirî, di 7 mêze werkirî, serê girre kêra kirî.
* Nêzîkî meteloka mesîn û hêkê ye.
* Pîvok: giyayeke.

6- Kumê hûtik, tije nûtik.
- Kumê hezî tije derzî.

7- Impîlê darîn e, ewil tal e, paşê şirîn e.

8- Heko yê biçûk rihêt wî di spî ne, heko yê
mezin rihêt wî di sor in, heku yê pîr, rihêt wî reş dibin.

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (252)

## Terora Parîsê ji aliyê “Mît”ê ve bi rê ve çû



**Piştê lêkolînek dûr û dirêj li hundir û derveyî welat, dewleta Firansayê hindek belgename eşkerek kirin ku tê de tê selimandin, dezgeha hewalgiriya Tirkiyê, wate “Mît”ê, terora sê çalakvanên ser bi PKK’ê li Parîsê encam daye.**

Rojnameya Lomond a Firansayê jî, li ser bingeha wan 46 belgenameyan, “Mît”ê weke sedema terora Sekîne Cansiz û Fîdan Doxan û Leyla Soylemez dide zanîn.
Dozgerê vê terorê herweha ragehand ku “Umer Gunay” tometbarê jimare yek ê vê dosiyê, ser bi dezgeha hewalgiriya Turkiyê wate Mîtê ye.

Belgename vê yekê eşkere dikin ku bona birêvebirina terora wan sê çalakvanan li pêtextê Firansayê, 6 hezar Euro hatiye dayîn û herweha di yek ji wan belgenameyan de faylek bi deng heye ku tê de 2 kesên ser bi dezgeha Mîtê tevî Umer Gunay daxivin û pîlana terorê dadirêjin.

## Hekî bejna te kurt be, agehdarî dilê xwe be

**Ev kesên ku bejna wan zaf bilind nine, egera vê ku rastî nexwşiya dil bên zaf e, ji ber vê sedemê ev kesên ku bejna wan kurt e, dibe zaf agehdarê saxlemiya xwe bin.**

Vekolînek nû li Berîtaniya li zanîngeha “Lîstir” hatiye encamdan, û li ser 183 hezar jin û mêran encamp dane, vekolînê eşkere kiriye ku ev kesên ku bejna wan kurt e, egera tûşbûna wan bi nexweşiya dil bi qasî % 13.5 zêde dibe.

Ev kesên ku bejna wan 1.52 mêtr bilind be, egera wan bi nexweşiya dil %32 zêdetir e ji wan kesane ku dirêjiya bejna wan 1.67 mêtr e.
Çavkanî: El-erebiye



## Çend pêşniyar bo bihêzbûna çav



**Şarezayên Almanî di warê çav de, eva eşkere kirin ku dikarin bi çend cur meşqkirina bi çavan, çav ji mandîbûn û hişikbûnê biparêzin, û ew yek dibe sedem bo çalakkirina soriya xwînê di çavan de, û hevdem çalakkirina rijîna rondikan.**

Herwisa piştî xwendin û karkirin li ser Kampiyoterê, dikarin wan çend rahênanan bi çavan bikin, bona vê ku çavên we ji bêhêzî û mandîbûnê bê parastin.

1-Miqandina çavan heta du xûlekan, û destên xwe jî danêne ser çavan.


2-Kêşana wêneyeke xir li ser kaxezê, û ev kaxez bi dîwar ve bê zeliqandin, û piştre çend xûlekan reşka çavên xwe bi awayê bazineyî bilivlivînin, ev yek dibe sedem bo bihêzbûna masûlkên çavan.

3-Mêzekirina wêneyeke gellek dûr ji çavên we.

## Pênc peykerên ku dema wan bi ser çû









Peykerê “Sîsîl Rodz” ku yek ji kesayetiyên serdema îsti’mara (Mêtingeriya) Berîtaniyayê bû, roja 09.04.2015’an û piştî nerazîbûnên xwendekaran, li ser zanîngeha Kîp Tawn a Afrîqaya Basûr anîn xwarê.
Di sala 2003’an de û piştî ku artêşa Amerîkayê dewleta Sedam Husên ji nav bir û dest bi ser bajarê Bexdayê de girtin, peykerê Sedam Husên li meydana sereke a bajarê Bexdayê anîn xwar.

Di sala 2011’an de, xelkê nerazî ê welatê Lîbiyayê, piştî serhildanek seranserî û herifandina deshilata wî çaxî, serê peykerê “Mu’emer Qezafî” jêkirin, û piştre lê dixistin.
Di heyva Desember a sala 2013’an de û di dema xwenîşandanên xelkê nerazî ji hikûmeta Rûsiyayê, xelkê nerazî peykerê “Wêladimîr Lênîn” rêberê şoreşa Rûsiyê anîn xwarê.

Di sala 1991’an de peykerê “Filîks Dirjînskî” avakerê yekemîn hêza nehênî a polîsê Şorewî naskirî bi “Çikê” li meydana Lobînaka ya bajarê Moskoyê anîn xwarê.

Di sala 2013’an de peykerê Boronz a Zeynedin Zeydan lîstikvanê Firansî ku tê de şêweya lêdana derbê li rikeberê xwe di Kûpa Cîhanî a sala 2006’an de derdixe, li nawenda pêtextê welatê Qeterê wate bajarê Dohê anîn xwarê.



www.avakurd.org